Mistefa Hicrî:
Felsefeya hebûna newrozê dibêje me ku berdewamiya li ser Rasanê remza mana Kurd e

»»»» R:3

Bidestveanîna mafên netewî yên gelê kurd
di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de

Agirî

Duheftînameyek Siayasî-Giştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî
www.agirimedia.org Hejmar (322) 20-03-2018 Buha (1000) Tûmen

Mela Hesen Şîweselî :

Bilind be alaya Kurdistanê, û her dilek jê hez neke, rebî şûr û xencer lê keve

»»»» R:5

Gurriya agirê Newroz û Rasanê

www.arsivakurd.org

Rêûresma newrozê di binkeya serekî ya PDKÎ de bi rê ve çû

Kurdistanmedia:Bi boneya cejna neteweyî û hatina sersala nû merasimeke bicoş di binkeya serekî ya PDKÎ de bi rê ve çû.

Nûçegihanê malpera "Kurdistanmedia"yê rage-hand ku roja Sêşemiyê 29`ê Reşemeyê rêûresema cejna neteweyî ya newrozê û hatina sersala nû ya Kurdî bi beşdariya lêpirsyarê giştî ê hizbê, endamên Navenda Siyasî û kadr û pêşmerge û malbatên PDKÎ di binkeya sereke ya PDKÎ de bi rê ve çû.

Destpêka merasimê bi sirûda neteweyî ya "Ey Reqîb" û ragirtina deqeyekê bêdengî bo rêzgirtina ji riha pak ya şehîdên hizb û gel dest pê kir. Piştre peyama newrozî ya PDKÎ ji aliyê rêzdar Mistefa Hicrî lêpirsyarê giştî ê PDKÎ ve hate pêşkêşkirin.

Hicrî di destpêka peyama xwe de bas ji vê kir: "Îsal jî di demekê de em ber bi pêşwaziya ji newrozê ve diçin, ku sala borî welat û neteweya me çendîn pêşhatên curbicur bi xwe ve dîtine, ku her yek ji wan em dikarin wekî serkevtin û alozî bihesibînin. Deskevtên ku pêşhatên Rojhilat, Başûr, û Rojavaya Kurdistanê bi xwe ve dîtine, û lawaziyên ku mînakên wê yên herî xûya û berçav di Başûr û Rojava de ne. Lê dema ku ji çavên newrozê ve, em li hemiyan dinêrin, di Rojhilat tenê nasnameyekê dixe bîra me de, ku ew jî nasnameya Rasanê ye. Rasan bi wateya berdewambûna li ser xebatê, bi armanca pêkvegirêdana xebata çiya û bajar". Mistefa Hicrî di axatina xwe de bas ji vê kir ku: "Di sala 1396`an de

»»»» R:2

Sergotar

Kerkûk, Kirmaşan, Efrîn, Newroz

N: Kerîm Perwîzî

Sala 1396`an salek bû tejî ji rûdawên dîrokî bo Kurdistan û bo Kurd. Bûyereke dîrokî hem dikare tall û hem şîrîn be, lê bi qasî mezinahiya bûyerê dikare di dîrokê de deng vede,yan bi watayeke din dîrokê bafirîne.

Çend qonaxên girîng ên dîroka îsal pêk tên ji:

Yekem Kerkûk: Piştî referandomeke dîrokî ku li Başûra Kurdistanê bi rê ve çû, wekî belgeyeke dîrokî dimîne ku neteweya Kurd çi dixwazin û di çi xakekê de çiqas deng aniye. Dijminên Kurd bi taybetî dijminê serekî ê Kurdistan û Kurd wate rejîma Îranê bi pîlan êrîşî ser Kurdistanê kirin, û Kerkûk dagîr kirin.
Ew bûyera di dîroka Kurdistanê de wekî terajidieke hertimî dimîne ku bi pîlana dijminan û bi hevkariya destên navxweyî ê Kurd karesat bi ser vê neteweyê de hat.

Duyem Kirmaşan: Di karesateke xwezayî de erdhejê li Kurdistanê da, û bi taybetî di navçeyên Kirmaşênê zêdetir xisar û zirara mirovî û madî lê ket, ku hêla jî karesta berdewam e, û qurbaniyan digre, û bi dehan hezar kes bêmal û hal mane, ew karesata mirovî û bûyera xwezayî, ji aliyê dijminên Kurdistanê wate rejîma Îranê ve kirin derfetek, bona vê ku guh nednê, û bi karesata xwezayî Kurd tê de here, û Kurdistan wêran be, û di bersivê de jî neteweya Kurd di Rojhilat bi hawara hevwelatiyên xwe de çûn, û hemaseyek afirnadin ku di dîrokê de wê bimîne.

Sêyem: Li Efrînê dewleta Tirkiyê bi hêceta hebûna çiqeke ser bi PKK êrîşî ser vê beşa xaka Kurdistanê kir, û xortên Efrînê jî xweragiriyeke bêmaînak kirin. Dastana xweragiriya jin û mêrên Efrînê wekî destaneke mezin di dîrokê de wê bimîne, herçend di encama vê êrîşê de Efrîn ket û hêza Tirkiyê çû nava bajar de. Xwargiriya Efrînê aliyekî wê yê din jî heye ku pêk tê ji siyaset û ber

»»» Doma manşêtê

cîhan şahidê pêkhatina mezintirîn û bibandortirîn guherîna siyasî û civakî di sertaserê Îranê de bû. Serhildana xelkê Îranê di vê salê de ku rejîm û dest û pêwendiyên wê hewl dan ku di çarçoveya giranî û kirîza aborî de pênaseyê jê re bikin, erdhejek bû ku piştî çend dehikan ji deshilatdariya vê rejîmê stûnên fikrî û felsefî ên hikûmetê têk rûxandin, û rûyê rasteqîne yê Komara Îslamî li derve û di navxwe de bo hemûyan eşkeretir kir”.
Navbirî herwisa ragehand: “Hekî di heyama van salan de, bi şanogerî û lêbandina xelkê xwast ku cîhanê wisa halî bike ku rejîm reformhilgir e, û pêngav bi pêngav ber bi reforman ve diçe, û reformîst bilindgoya vê siyaseta xapînok bûn, xwendekaran di zankoya Tehranê de hawar kirin ku “reformxwaz û muhafizekarno! hikayetên we bi dawî hatin” û bi vî rengî ew sehra rejîma cadûger hilweşandin, ew diruşm heman hez û armancek e ku bi dehan salî ye ku PDKÎ hewl daye ku vê rastiyê bo xelkê Îranê rohn bike, ku kêşeya bingehîn li Îranê Komara Îslamî ye, ne reformxwaz û muhafizekar”.

Piştî gotinên birêz lêpirsyarê giştî sirûdek li jêr navê “Newroz” ji aliyê koma muzîkê ya PDKÎ ve pêşkêşî beşdarên merasimê hate kirin.
Di beşeke din de parçe helbestek li jêr navê “Rêbaz” ji aliyê Şerîf Felah ve hate xwendin.

Piştre stranek li jêr navê “Berî Beyanî” bi dengê hunermend “Xulam Fatihî” û Xatû Bêhnaz Tewesolî hate pêşkêşkirin.
Bi boneya cejna newrozê û hatina sersala nû ya Kurdî zarokên ser bi Navenda Nêrgiz a PDKÎ sirûdek li jêr navê “Newroz” bi serperestiya Zemend Beharî pêşkêş kirin.

Piştre çend tabloyên govenda reşbelek ji aliyê girûpa govenda Kurdistanê ve hatin pêşkêşkirin.
Di beşa duyem ya vê merasimê de daxwaz ji Mistefa Hicrî û kak Selah Rehmanî bavê şehîd Sebah Rehmanî hate kirin, ku xetîra agir ji destên ciwanan wergirin, û agirê newroza 1397 (2718)`an a Kurdî hilkin, ku hevdem jî sirûda “Emrojî salî taze ye” hate pêşkêşkirin. Ew merasim bi govend û dîlanê bi dawî hat.

nameya şaş ya partiyeke Kurdî, ku hewce ye Kurd ezmûnê lê wergire. Herçend ku xweragiriya Efrînê jibîrnekirî û dîrokî ye, lê nabe bibe sedema vê ku em sedemên vê şikesta tall ya vê dorandina mezin nebînin.

Ew sê qonaxên sereke di sê beşên Kurdistanê wekî destanên zincîreyek ji bîreweriyên dîrokî ên netewe û xakekê dimînin. Sê bûyerên cuda ku her yek ji wan çend aliyekê ji jiyana neteweya Kurd û xaka Kurdistanê vedigêrin, û dîrokekê diafirînin. Jiber ku hesta neteweyî û têgihîştin ji hebûneke hevbeş ya neteweyî tenê bi nivîsîn û axavtinê nabe, belkû bûyerên tall û şirîn ên dîrokê ne, ku nasnameyeke dîrokî diafirînin. Merc nine ku tenê hemase bikare destana neteweyekê be, û nasnameyê jê re çê bike, belkû terajidiyê jî ew şiyan heye ku bibe hêzeke palder ku neteweyek hesta hevbeş di wan de bihêz bike, û bikare bibe paramêtra pêkhînerê nasnameya neteweyî ji wan re.

Herwekî çawa di nava Yehûdiyan de dîroka pirr ji karesat û Holokastê bûye nasnameya wan, û neteweyeke bihêz ji wan afirandiye, û Kurdistan û Kurd jî hem dikare terajidiyan û hem jî destana xweragirî û hem jî afirandina destanrêsiyan, bike nasname.

Di vir de ye ku em digihîjin remzeke girîng ya Kurd û Kurddistanê ku ew jî newroz e. Ew bûyerên tall û karesatbar û herwisa hemaseyî ên Kurd gellrk caran di dîrokê de nîşan daye, ku di newrozê de bi zimaneke neteweyî û cemawerî hatiye wergerandin bo ser kiryareke hevbeş û nîşana serhildan û rabûn û Rasana neteweyî bûye.
Newroz bingeheke girîng ya hebûna neteweyî ya me ye, jiber ku nasnameya hebûna me bihêztir dike. Em neteweyek in ku di nava karestaê de bi serhildan û Rasanê ve xalîşînka şevatên xwe dadikutin, û desatanan dirêsin. Kurd serfiraz û Kurdistan avedan û newroza me pîroz.

www.arsivakurd.com

Rêzdar Mistefa Hicrî lêpirsyarê giştî ê PDKÎ bi boneya sala nû peyamek pêşkêş kir

Di yek ji binkeyên PDKÎ de, Mistefa Hicrî lêpirsyarê giştî ê PDKÎ bi boneya sala nû peyamek pêşkêş kir, û hêviya saleke pirr ji deskevt ji gelê Kurd re xwast.

Deqa peyamê weha ye:

Hevwelatiyên têkoşer!
Xûşk û birayên hêja! Bila li destpêka sala nû û cejna newrozê de, em silav û pîrozbahiyên xwe bişînin bo civatên xelkê Kurdistanê, malbatên şehîdan, kêmendamên riya xebatê, girtiyên siyasî û kadr û pêşmerge û endam û alîgirên PDKÎ, û hemû çalakên siyasî di raserî Îranê de, û bi taybetî lawên hişyar û çavnetirs ên Kurd ku sala 1396`an wekî hemû salên borî li jêr zext û serkutkirina rejîma dijîazadiyê de, cesûrane xebata xwe ji bo azadiya gel û nîştiman domandin, û ji tekoşînê nesekinîn.

Kurdistaniyên xweragir!

Îsal jî di demekê de em ber bi pêşwaziya ji newrozê ve diçin, ku sala borî welat û neteweya me çendîn pêşhatên curbicur bi xwe ve dîtine, ku her yek ji wan em dikarin wekî serkevtin û alozî bihesibînin. Deskevtên ku pêşhatên Rojhilat, Başûr, û Rojavaya Kurdistanê bi xwe ve dîtine, û lawaziyên ku mînakên wê yên herî xûya û berçav di Başûr û Rojava de ne. Lê dema ku ji çavên newrozê ve, em li hemiyan dinêrin, di Rojhilat tenê nasnameyekê dixe bîra me de, ku ew jî nasnameya Rasanê ye. Rasan bi wateya berdewambûna li ser xebatê, bi armanca pêkvegirêdana xebata çiya û bajar.

Wisa dixûye ku welat û neteweya Kurd berbirûyê deskevt û gellek lawaziyan bin, lê felsefeya hebûna newrozê dibêje me ku berdewamiya li ser Rasanê remza mana Kurd be, newrozê em fêr kirine, ku em tenê ber bi pêşwaziya ji nûbûna xwezayê ve naçin, belkû hertim rûyê me li Rasan û rabûnê ye di hemberî dijberên Kurd, û geriyan li pey encamgehandina dozekê be, ku dehan sal e Kurdistanî xebatê ji bo wê dikin, û ji newrozê ve em hîn bûne ku li ser nûbûn û tekoşînê berdewam bin, jiber ku rawestan bê wate ye. Herwek çawa xweza ji nûbûnê nasekine, Kurd jî ji tekoşîna bo gihîştina bi armancên xwe nekeve. Neteweyek ku jêrxana fikrî û felsefeya wê ew be, ku qebûla zulmê nake, dibe berdewam be ser rabûnê û afirandina cîhanek ku tê de hest bi aramî û rizgarî û azadiyê bike.

Rasana Rojhilat jî ji dil û kûrahiya eqliyeteke weha ve çavkanî girtiye, ji dilê eqliyetekê ve ku dibe xwe nû bike, û hizra nû bixe meydanê. Bo vê mebestê xwe ji bo hemû alavekê amade bike, ku dikare jê re alîakr be, û em wekî PDKÎ bi bingehwergirtina vê boçûnê ji çend salên borî ve, xwe ji bo pêkanîna guherînkariyan di hizba xwe de amade kir, lewra li bereberê newroza îsal de em diarin vê mizgîniyê bidin we, ku riya nûbûna xebata Rojhilat roj li pey roj xweştir dibe, bi mercekê ku em aram nebin, da ku bikarin heya newroza bê, deskevtên zêdetir bi dest bixin.

Me di destpêka meha Reşemeya sala 1396`an de kongireya 16.emîn ya hizba xwe kongireya Rasana Rojhilat bi serkevtin ve bi rê ve bir, kongireyek ku derwazeyên xwe bi rûyên nûbûna hizba me xiste ser piştê, bona vê ku PDKÎ bikare hevpêngav digel guhertinên civakê xwe rêk bixe, û ber bi vegeşîn û nûbûnê pêngavan hilgire, lê heya gihîştina bi armancên xwe sal bi salê em hewlên zêdetir jê re didin û mandî nabin, di sala borî de Kurdistaniyan li Başûr rabûneke mezin bi xwe ve dîtin, ku ew jî îradeya referandomê bû da ku buharekê di payîzê de saz bikin, ew Rasana Başûr hemû neyar li hemberî Kurdan qît kiriye, da ku nehêlin ku Kurd di vê beşê de riya serkevtina xwe misoger bikin, lê neteweyek ku hilgirê felsefeya newroz û Rasanê be, zehmet e ku ji vê riyê vekêşe yan bikeve qedeman jiber ku di nasnameya me de yek tişt cihgir bûye ew jî neketin heya serkevtinê ye. Herwekî çawa Rojhilatiyan di nav dilê dijmin de şahiya alayê girtin, da ku nîşan bidin ku "Ew reqîb her maye qewmê Kurdziman". Ji aliyekî din ve sala borî Rojhilata Kurdistanê rastî karesateke dilêş hat, ku ew jî erdheja Kirmaşanê bû, lê Kurdan ew karesat kirin hemaseyek, û karwanê alîkariyan ji hemû bajaran û gundên Kurdistanê rêz bûn. Wekî çawa ku pêşmerge rêz disekinin bo cihgirbûna li himbêza nîştiman, bo karesata Kirmaşanê jî, Ebûbekir Me`irûfiyan bi îradeya nîştimanperwerane ve, xema hevwelatiyên lêqewmayî wekî xema xwe dane zanîn, û qurbanî jî di vê riyê de dan, da ku bêjin herçend xwedî dewlet û deshilat nînin, lê yekgirtî û xwedî îrade ne, îradeyek ku bûye çiqla çavên Komara Îslamî û dest û pêwendiyên wê.

Her di vê salê de bû, ku arteşa Bexdayê êrîşî ser Kerkûkê kir li Herêma Kurdisatanê da ku bi xeyala xwe îradeya Kurd têk bidini, lê hem dîsan bebrirûyê neteweyekê bûne ku fêrî bindestiyê nebûne, bi taybetî ku çend salek e ku azadî û rizgariyê tam dikin, lewra di demekê de ku kurd tenê bû,

> Em wekî PDKÎ di çepera Kurd û Kurdistanê de ne, û her karesatek bê serê neteweya me, em wekî karesata xwe dizanin, bi bê cudahiya parçeyên Kurdistanê

lê çeper vala nekir, bo yên ku têhniyê feth û fitûhatan bûn.

Her di sala borî de bû ku hevpeymaniya cîhanî paşekêşe bi DAÎŞ`ê kir, û piraniya navçeyan bi alîkariya Kurd ji DAÎŞ`ê wergire, bi awayekê ku hekî alîkariya Kurd neba, wisa dixuya ku lawazkirina DAÎŞ`ê gellek bizehmet ba, lê herwekî çawa di destpêkê de li ser vê bawerê de bûn, niha jî em ser vê baweriyê ne ku DAÎŞ`ê rasteqîne Komara Îslamiya Îranê ye. Komarek ku diya hemû DAÎŞ`yan û teror û bedbextiyan e di navçeyê de, lewra em li ser vê baweriyê ne ku heya Komara Îslamiya Îranê mabe, cîhan nikare DAÎŞ û DAÎŞ`iyan binbir bike.
Yekî din ji van kêşeyên ku di van mehên dawiyê de pêsîra Kurd girt, êrîşa li ser Efrînê ye. Êrîşek ku ezmûna Kurd li Rojava xiste metirsiyê de. Lewra di vir de jî em wekî PDKÎ di çepera Kurd û Kurdistanê de ne, û her karesatek bê serê neteweya me, em wekî karesata xwe dizanin, bi bê cudahiya parçeyên Kurdistanê. Efrîn birîndar e, herwekî ku çawa Kerkûk birîndar kirin, lê ew birîn wê bicebirin, axir Kurdistan birîn dibe, lê namire, Efrîn û kerkûk jî wê rabin ser piyan, û ji bo azadî û rizgariya xwe qît dibin.

Ez dixwazim ku ji vê derfetê mifahê wergirim bo zelalkirina siyaseta hizba xwe, li hemberî bernameyên rejîmê

li dijî xebat û berxwedana rewa ya xelkê, û PDKÎ. Di vê rojê de em agehdar in ku rejîm îsal jî wekî salên borî mijûlî amadekariyê ye bona vê ku bi pîlana terorkirinê û pêkanîna zexta li ser rêberatiya hizbê li Başûr, û hewldan bo pêkanîna dubendiyê di nava hêzên Kurd de, gellek xewn û xeyalên din jî hekî ji desta bihê, li ser riya geşekirina hizbê, û li ser riya kar û tekoşîna hizbê, astengiyan pêk bîne, lê ne reftarên Komara Îslamî ji me re nû ne, ne jî pîlanên wê pêngavên me sist dikin, jiber ku di heyama van çar dehikan de, bo hemûyan eşkere bûye ku Kurdê Rojhilat û bi taybetî PDKÎ hêzek nine ku ji pîlanên rejîmê bitirse, yan paşekêşeyê bike, berevajî bi vî karê xwe me pal didin ku zêdetir ji caran xwe ji bo xebateke tund û qahîm amade bikin, xebatek ku şeqam û kolanên bajarên Rojhilat melbend û wargehê serekî yê wê ye. Xwediyê vê xebatê xelkê Rojhilate û îradeya wan e ku Komara Îslamî be`ecandiye ku wisa dike hawara xwe bo hemû kiryareke nemirovane bibin. Lê ew pîlan hekî hawara Komara Îslamî de hatiban, di çil salên borî de, dikarî dengê hawara xelkê bifetisînin, lê niha dengê mafxwaziya xelkê zelaltir ji hertim di guhê xelkê cîhanê de zinegzing lê tê.

Di sala 1396`an de cîhan şahidê pêkhatina mezintirîn û bibandortirîn guherîna siyasî û civakî di sertaserê Îranê de bû. Serhildana xelkê Îranê di vê salê de ku rejîm û dest û pêwendiyên wê hewl dan ku di çarçoveya giranî û kirîza aborî de pênaseyê jê re bikin, erdhejek bû ku piştî çend dehikan ji deshilatdariya vê rejîmê stûnên fikrî û felsefî ên hikûmetê têk

rûxandin, û rûyê rasteqîne yê Komara Îslamî li derve û di navxwe de bo hemûyan eşkeretir kir.

Hekî di heyama çil salên borî de rejîmê dilê xwe bi vê xweş kiriye ku esleke nû li jêr perwerdeya Îslama Şî`e ya Wilayeta Feqîh de bi cî kiriye, û ew esl garantiya hikûmeteke heta-hetayî ya rejîmê ye, keç û jinên cesûr û guherînxwaz her di vê eslê de, li dijî felsefeya serpûşa bizorî di meydanên pirr heşîmet ên Tehranê serpûşên xwe vêde dan, û bi darekê ew serpûş bilind kirine bi nîşaneya pûçkirina te`alîmên çil sale yên rejîmê.

Hekî di heyama van salan de, bi şanogerî û lêbandina xelkê xwast ku cîhanê wisa halî bike ku rejîm reformhilgir e, û pêngav bi pêngav ber bi reforman ve diçe, û reformîst bilindgoya vê siyaseta xapînok bûn, xwendekaran di zankoya Tehranê de hawar kirin ku “reformxwaz û muhafizekarno! hikayetên we bi dawî hatin” û bi vî rengî ew sehra rejîma cadûger hilweşandin, ew diruşm heman hez û armancek e ku bi dehan salî ye ku PDKÎ hewl daye ku vê rastiyê bo xelkê Îranê rohn bike, ku kêşeya bingehîn li Îranê Komara Îslamî ye, ne reformxwaz û muhafizekar. Ew guhertin hevdem bûn digel girjbûna cîhana derve li hemberî Komara Îslamî de. Lewra Komara Îslamî zêdetir ji caran dirr bûye û tundûtîjtir xelkê serkut dike, û ji serkutkirina destbiserkiriyên raperînê ve bigre heta kuştina wan di girtîgehan de, ku hemû dibêjne me ku Komara Îslamî êdî nikare bi navê pêkanîna guherînên berçav di welat reformên pêngav bi pêngav yan parastina emniyeta Îranê, xelkê ji rê derxîne.

Em têkoşer û azadîxwazên kurd mil bi milên hemû azadîxwazên Îranê heya gihîştina bi armancên gel, ku rizgarbûna ji destê vê rejîmê ye nasekinin, û xatircem in ku di dawiyê de serkevtin her bo me ye, û neman bo rejîma dijîmirovî ya Komara Îslamî ya Îranê.

Cardin newroza bixeml, û sala we ya nû pîroz be

Vekirina kongireya 16.mîn ya PDKÎ ji aliyê birêz Mela Hesen Şîweselî ve

Birêz Mela Hesen Şîweselî ku niha endamî îftixarî yê Navenda Siyasî ya PDKÎ ye, di kongireya 16.emîn de bi gotareke balkêş û têrûtejî kongire vekiribû, ku deqa gotinên wî weha ne:

Şêrexûşkno, Birayên leheng!
Tevî hurmet ji bo vê bihevgihîştina me ya hêja, ji min re şerefek mezin e ku di baregeha bilind ya gellek alîgirên Rasana Rojhilat de, bi dîtina we şa dibim, û we himbêz dikim.

Hêjani! Di vê rewşa hestiyar de ku şademarên erdnîgariya par-parkirî a welatê me, li jêr gefa têkdana modela nû de ye,û gelê me li jêr qirmîna çekên leyzêrî ên wêrankar de, ji çolgehên mehşer ên bixwîn re derbaz dibin, cihê rêzgirtinê ye,ku hevalên me bi erk û wezîfeya xwe ya pîroz ya girtina kongireya 16.emîn a PDKÎ rabûne, û li şemendefera bixwîn ya Rasana Rojhilat de li ser birrîn û pîvana riyên dijwar herwisa berdewam in.

Hêjano!

Hem zimanhalê kongirê û hem jî rewşa xûya ya navçê û hem signal û îşareyên derdorê, vê rastiyê dixin himbêza me, ku kongireya me ya vê carê digel kongireyên borî cudahiyeke yekcar zêde heye, bi vê watayê ku rewş û guherînkariyên gengaz (îhtimalî) ên hevkêşeyên aloz, erkên gellek giran û di heman demê de, nû dixin ser milên me, û çavnihêrî jî ew in, ku bi bawerdarbûna bi pirensîpên hevçeperiyê, û li gora pêbendî û girêdayîbûna rohn û zelal ya niyetpakane bersiva van sîgnalan bê dan.

Hêjano!

Di vê demê de ku li burca navdar ya berfireh ya Rasana Rojhilat de, ez di xizmeta we de sekinî me, hez dikim ku îznê bidin ku em pêkve rêz ji şehîdên her çar parçeyên Kurdistanê bigrin, û silavan bişînin bo çar bûyerên nû ên navçeyê wate silavan bişînin ji bo qurbaniyên vê hereketa sertaseriya Îranê, ji bo tazîdariya erdheaj Rojhilata Kurdistanê, û ji bo şehîdên cardin êxsîrbûna qudsa Kurdan, û herwisa bo bêmalûhal ên Efrînê û rêz û hurmeta taybetî siwarçakên Rasanê, ew şasiwarên ku wek gullalle û wek sorgulan di destpka vegeşîna xwe de, serê xwe danîn, û sicde û kurnûj ji bo dar û kevirên bixwîn ên kurdistanê birin, û di hinavê erdê hilalî ê xwe de, serê xwe li ser kevirê xeva ebedî danîn. Herwisa himbêza germ ji bo wan gulên çiyayî ku di nava xaliya bixwîn a Rasanê de çilû dan, û reh û rîşe dakutan, û hejandin û lawandina ruh jî, bo wan bazên bilindfir ku di koçkirina xwe ya sor de, ber bi mî`iraca ebedî firiyan, û tu carî venegeriyan.

Şêrexûşkên min û birayên leheng!

Ezê hestên xwe bas bikim. Bo min janeke mezin bû, ku dehan sal bû, ji kongireyên hizbê veqetiyabûm, û niha ser ji nû ez vejiyam, dema ku min xwe bebrirûyê xebatkarên nava çeperê û afirînerên nexşeriya Rasanê û rêvîngên riya liv tevger û rabûna lehengane dibînim. Vegeriyana min ji dûriyeke sirr û sar û tevizî û goristaneke tarî bo cîhaneke rohn ku xwe berbirûyê, siyasetvanên xwedîezmûn ên xwîna cigerxwarî û siyasetvanên bihêz û bawerdar û taze nefes û şervanên leheng, ku devs û şûna piyên wan wekî hajeya şîpelên behreke berfireh, hest û derûna min (nava bedena min) dilorînin.

Xwezî ku ez di rewşekê de bûma, ku min bikarîba qevdeke gulan a mezin bi bilindahiya bejn û bal, û tekoşîna canliserdestan, û bi geşiya xwîna şehîdên qonaxa me ya nû li pêşberî baregeha bilind ya kongireya 16.mîn ya PDKÎ danêm. Di vê derheqê de ez bidax (bikul û keser) im. Lewra kerema xwe îznê bidin min,ku bi vê kilîda remzî ku wekî mîdala şanaziyê we bexşiye min,ez derwazeya şeref û şanaziya hizûra xwe di vê rewş û hewayê pîroz de bi dest bixim, pêştir rêz û emegnasî û pîrozbahiyên xwe û nêzîktirîn kesên xwe pêşkêşî we hemû beşdarên kongirê û ji riya we ve bigehînim hemû malbatên şehîdan û girtiyên siyasî û endam û alîgir û sewdaserên azadiyê û demokrasî û serweriya neteweyî.

Hêjano!

Mela Hesen Şîweselî :

Bilind be alaya Kurdistanê, û her dilek jê hez neke, rebî şûr û xencer lê keve

Şanaziyê dikim ku PDKÎ ji van hemû qonaxên dijwar re derbaz dibe, lê ji nefeskêşanê nakeve. Em hemû şahîdê gellek reşeşevên dûr û direj û reş û tarî ne, li vir de renge baskirina hinek meseleyan hem hederdana wext û hem jî tall û nebaş û hem jî nesiyasiyane be, lê dîrok e û em nikarin bê awrîdan û baskirinê bi ser de derbaz bin, di vir de gellek bi kurtî tenê emê nîve awrîdanekê bidin yek qonaxî, û em hemû şahidê vê qonaxa biêş û azar in, ku PDKÎ li heft esmanan stêrkeke wê nema,derbiderê nava qadeke wisa tirsnak bû, ku ji bilî beşeke kêm ji dostan û hevpeymanên mêjîn, ji bilî beşeke kêm ji dost û hevalan û

www.arsivakurd.org

hevalbendên mêjîn, ji bilî derwazeyên li ser pişt ên dilsojên navxwe hemû derî bi rûyê PDKÎ hatine daxistin, lê PDKÎ aram û bêhnfireh wekî çiya di nava vê qada bisam de çeqiya, û heykelê Kurdane ê wê neçemiya, û li ser birrîn û pîvana tarîstanan û şeqkirina şevreşan bibawer ve pê dagirt, û pişta wê nekete erdê.
Hêjano!

Ez serbilind im, û gellek jî serbilind im, ku PDKÎ helmeta Rasanê (heva rabûnê) li jêr sîvana bergirî û esla mentiqî û bicî ragehandiye, û awriyeke cidî û bikiryar daye rewşa niha û xeta cînayetkaran û hêza rizî a Komara Îslamî ya Îranê. Me ji bilî heqîqetê tiştek negotiye ku hekî em bêjin Rasan guhertin û hewcehiya dîrokî û vegeriyana mezinahî û nîşandana heybeta şoreşgerane ya PDKÎ û ramalîna şevereşa bêhêvîtî û bêasoyiyê bû, resalet û peyamek bû ku lehengane hate encamdan, û niha jî serbarê hemû êş û azaran, û ba û bahozên ku xwe wekî rûçikê heykelê birîndar ê PDKÎ dikêşin, hizba me li ser cemawerîtirkirin û berfirehtirkirin û xelkîtirkirina Rasanê herwisa berdewam maye, û berdewam jî dibe.
Hêjano!

Hûn baştir agehdar in ku hinek dengên nasaz hene, ku dixwazin ne tenê rewabûna Rasanê belkû rewabûna xebata gelê me bibin jêr pirsyar, lê bi xweşî ve belge gellek zor in ku rewabûn û adilanebûna xebata gelê me û rastiya rewayiya Rasanê di destên me de ne, ku tenê emê mînakekê bas bikin.

Piraniya hêzên siyasî ên Rojhilata Kurdistanê wekî dengê heqxwazane ê piraniya gelê Kurd li Rojhilat rexne li Rasanê hebûn û têdîtinên taybetî ên xwe hebûn, lê li kêşeya Rasanê de gellek xwe bi cuda nezanîn, û niha jî ew hinda ku em bizanin di nava piraniya herî zaf ya van hêzên siyasî de, cuda ji selîqe û boçûnan çeperên cuda nahên dîtin, belkû çepera bixwîn a hevpar li ser erdê heyî geş geş diçilvile û vedigeşe, ku ez ji aliyê xwe ve ya ku nîşana peyakirina aştiya berdewam û sîgnala rêkxistina pilatforma siyasî ya hevpar û destpêka pêkanîna eniyeke demokratîk a Rojhilat dibînim ku hêvî dikim hindî zûtir pêk bê.

Hêjano!

Rast e ku hizba me di piroseya Rasanê de nirxeke giran kete ser Milan, lê canliserdestên me gellek peyamên bisoz û bikul û keser û gellek hawarên mirovî gehandin guhê

belengazên navxwe û Rojhilata kurdistanê û beşeke rûniştiyên vê cîhanê. Cangoriyên me ji mînbera herî bilind ya xwebexşînê ve û ji mînbera fedakarî û cangorîtiyê ve, hawar kirin ku Rojhilata Kurdistanê û bêçareyî û bêhelwestî negotine, Rojhilata Kurdistanê û stûxwarbûna li hemberî îrade û qedereke li pêş de diyarîkirî negotine.

Rojhilata Kurdistanê û botperestî û çavgirêdayîbûn û birêveberên fetwaya biyom ya cîhada seherkeran negotine, Rojhilata Kurdistanê û nîqaşa Siyasî ya bêwext negotine,Rojhilata Kurdistanê û şanosazî û sînaryorengandin û pirsên hestiyar û bazerganîkirin bi siyasetê negotine, di hember d ejî şehîdên me, ji kûrahiya vijdana xwe ve, hawar kirin ku Rojhilata Kurdistanê û ne`iretelêdan û îradeya cidî û eqlê azad û bergiriya cesûrane û meydanî lê tê. Rojhilata Kurdistanê û girtina pêsîra cellad û xwînmijan û tabûtên mîratgirên tabûtê, û xebata li dijî stemkarên dîrokê yektir dixwînin. Rojhilata Kurdistanê û şikandina talisman û ramalîna botan û "Na"yeke yekcarî gotina bi sîstema wilayetsalarî dibe ku dest bavêjin stûyê hevdu, û Rojhilata Kurdistanê nikare bo hertim şîpelan û peravên rûbaran û "bêvîn"îya bûyerên siyasî be.

Rojhilata Kurdistanê îrade û kesayetiya taybet bi xwe heye, vegeşiyaye û ji heriyê derketiye, ji bilî pisporên kêm mînak ên zanistên curbicur gellek rojnamevanên netirs û sînemakarên mu`icizeker û siyasetvanên xwedîşiyan û berevankarên mafên mirovî di nava hinavê xwe de perwerde kiriye, rast e ku rejîm bi tenê ji Kurdistanê ve naherife, û hizba me, ew hinda ku di bîra min de be,ne di zimanê fermî de, û ne jî di edebiyata siyasî ya xwe de, ew îdia nekiriye, lê di vir de, di demjimêra muqedes ya kongireyê de, me pê şerm nine, û bi eşkere em radigehînin ku Rojhilata Kurdistanê wekî hertim dikare çepera azadîxwazan û şûreya hesinîn û palpişteke qahîm û kûr û cihê baweriyê be, û di rewşa pêkhatî de, tevî neteweyên din ên blindest ên Îranê dikarin bibin lehiyeke berfireh û koşka seherkeran û dizên ser riyan bo hertim ramalin, di derbazbûyî de me gotiye û niha jî dibêjin û sedan carên din jî me pê şerm nine ku bêjin di pêşerojê de, ku Rasan guherîn û ser ji nû vejiyan û rabûn û şerafet û kerameta me ye, û ji bo parastina vê kerametê em amade ne heya dawî dilopa xwîna xwe şiyana xwe bi kar bînin, û em xatircem in jî, ku pêşeroj ya neteweyên belengaz ên Îranê ye. Hevalên min ên hêaj!

Rasanê cardin ew heqîqet piştrast kir,ku her neteweyeke belengaz hekî kadrên wî ên siyasî û xwedîşiyan û kêrhatî di qada germ ya kêşeyên navxwe de tunebin, ji armancên xwe dûr dikeve,û her neteweyeke li jêr tepeseriyê de, hekî şervanekî canliserdest û leheng û congorî di qada germ ya şerê heq û neheqiyê û rageşî û lihevketina di navbera tarîtî û ronahiyê de nebe,nakeve ser rê û şopa serkevtinê, û nebûna van du sedemên bibandor mil bi mil û hevterîb digel yektir bi armanca bergirî û parêzgarî ji man û hebûn û himbêzkirina nirx û buhayên mirovî çoka neteweyên bindest ên cîhanê dişkîne, gotinên min dirêj bûn, û ez şermezarê we me, û daxwaza lêborînê li we dikim, lewra derheq navika kongireyê tenê ew qas erzî xizmeta we dikim ku hevalên me bi armanca reforman û bi armanca livandineke salim û hekîmane, gellek pêşniyarên cidî û rênîşandanên afirîner û diruşmên bicî û li gora serdemê hene, ku di piroseya karûbarê kongirê de wê di kongireyê de bas bikin.
Hêvî dikim kongireya 16`an a PDKÎ bibe hêvinê hevdengiyê, û bibe sekoyek ji bo firîna ber bi qonaxeke nû ku tê de, hizba me bikare bi ew qasê yekgirtîbûn û bi ew qasê bêhnfirehiyê û bi ew qasê yekîtiya kêm mînak û paradaym û metodên bicî ê xebata xwe digel erdnîgariya siyasî û guherînan û hevkêşeyên navxwe û herêm û cîhanê hevaheng bike.

Silavan dişînim bo azadîxwazên sertaserî ên vê cîhanê

Serîtewandin bo îmamên siyasî, Pêşewa û Qasimlo û Şerefkendî
Rêz û kurnûj û lawandina ruha bêferq û cudahî a canê pak ê şehîdên Rojhilata Kurdistanê û bitaybetî şehîdên qonaxa nû ya me, û xatircem im taca şanaziya ser serê malbat û kesûkarê wan bo hertim di dîrokê de biçirûsktir dimîne.

Silavan dişînim bo xelkê serhildêr ê Kurdistanê û sertaserê Kurdistanê
Rêz ji bo kêmendaman

Silav bo girtiyên siyasî û bitaybetî silavên taybetî dişînim bo Nîlson Mandêlayên pîrbûyî di nava girtîgehên rejîmê de û bitaybetî kak Mihemed Nezerî û silaveke taybetîtir dişînim bo Nîlson Mandêlayê zincîrqetîn ê Rojhilata Kurdistanê kak Sidîq Kebûdwend.

Pênûsa kadrên têkoşer û dest û tiliyên ser gelengedena van pêşmergeyan li ser serê xwe datînim, ku di çepera bergiriyê de bi lehengî berxwe didin. Serkevtî bin PDKÎ û hêzên siyasî ên Rojhilata kurdistanê ji bo pêkanîna eniyeke yekgirtî ya Rojhilatî û cemawerîtir ji Rasanê û awrîdaneke cidî ya bikiryar.

Serkeve kongireya 16.emîn ya PDKÎ
Herifîn bo koşka çetenişîn a Cemaranê

Bilind be alaya Kurdistanê û
Her dilek jê hez neke, rebî şûr û xencer lê keve
Spasiya we dikim

www.arsivakurd.org

Panoramaya sala 1396 (21`êAdara 2017-20`ê Adara 2018)`an

A: Kurdistan

07.02.1396 (27.04.2017)`an: Şeş aliyên Kurdistana Rojhilat daxwaz ji hemû xelkê Kurdistana Rojhilat kirin ku di hilbijartinên roja 29`ê Banemerê de beşdariyê nekin.

Şeş aliyên Kurdistana Rojhilat pêkhatî ji PDKÎ, Komeleya Zehmetkêşan, Komeleya Şoreşger ya Zehmetkêşên Kurdistana Îranê, Saziya Xebat a Kurdistana Îranê, Komele (Rlkxirawa Kurdistanî ya Hizba Komonîst a Îranê) û Hevalên Pêşîn di daxuyaniyeke hevbeş de, hilbijartinên serkomariyê a rejîma Îranê baykot kirin, û daxwaz ji hemû xelkê Kurdistana Rojhilat kirin ku wekî dijkiryarekê li hemberî hemû neheqiyan, di hilbijartinên roja 29`ê Banemerê de beşdariyê nekin.

Pûşpera 1396 (July 2017)`an: Navê şehîdên nû yên Rasanê di hemaseyên Qereseqel û Kosalanê hate ragehand

Piştî salekê şopandina bi hûrî ya PDKÎ û dilsojên hizbê, di navçeyên Merîwan û Şinoyê, derket ku mixabin çend xortên bicerg ên PDKÎ di nava agirê kerb û kîna dijmin de canê xwe ê pak kirine goriyê riya pirr ji serweriya azadiya gel û nîştiman, û tevlî refên karwanê pirr ji şanazî ya şehîdên Kurdistanê bûne.

Navê van şehîdan ev in:

Şehîd Bêhzad Pîrotî: Kurê Husên Pîrotî ye, û sala 1373`an li bajarê Şinoyê de ji dayîk bûye.
Şehîd Elî Mehmûdî (Şemal): Kurê Kerîm sala 1366`an ji dayîk bûye.
Şehîd Mêhdî Şêxî: Kurê Hemexan, sala 1338`an di gundê Tewrîwer a navçeya Jawer ya Sinê de ji dayîk bûye.

Şehîd Berzan Husênî: Kurê Osman e, û ji dayîkbûyê sala 1356`an e, û li Belebzan a ser bi bajarê Pawe ji dayîk bûye.
Şehîd Ruhullah Heyderî: Kurê Mihemed, ji dayîkbûyê sala 1348`an , ji gundê Degag a navçeya Şamyan a ser bi şaristana Sewlawa ye.

Şehîd Sahib Husênî: Kurê Ezîz sala 1367`an di gundê Helwan a Jaweroya Sineyê ji dayîk bûye.

Şehîd Efşar Sûre: Kurê Mehmûd e, û di sala 1366`an li gundê Tewrîwer a navçeya Jawero a Sineyê ji dayîk bûye.

Şehîd Hîwa Qurbanî: Kurê Hesen e, di sala 1370`î de li Kamyaranê ji dayîk bûye.

2017.08.03 (1396.05.12): Kirîs Koçêrayê rojnamevan û dostê gelê kurd û Hizba Demokrat koça dawiyê kir

Rojnamevan, nivîskar û dostê gelê kurd û Hizba Demokrat a Kurdistana Îranê, Kirîs Koçêra li jiyê 79 saliyê de koça dawiyê kir.

Piştî sê rojan, nûçeya koça dawiya Kirîs Koçêra ji aliyê ''Êdît Koçêra''ya hevsera wî ve hat piştrst kirin.

Kirîs Koçêra parek zaf ji jiyana xwe ji bo lêkolîna ji dîroka gelê kurd û xistine rojeva pirsgirêkên siyasî û civakî ên neteweya kurd veqetandibû û li vê derheqê de komek berhemên binirx pêşkeşî pirtûkxaneya cîhan û ya gelê kurd kiriye.

Ew rojnamevanê Firansî, dostê gelê kurd bi giştî û Hizba Demokrat û Dr. Qasimlû bi taybetî bû.

Li gorî nivîsên wî, bîr û hizrên dr. Qasimlû ewqas bandor lê kirine ku ne tenê wekî rojnamevanekê kar û xebatê ji bo gihandina dengê kurdan bike, belkî hewil bide li ser dîroka kurdan jî lêkolînê bike û pênc pirtûkan li ser dîroka kurdan binivîse ku pêk tên ji:

- Tevgera Netewî a Kurd, çapa sala 1979
- Alengarî Kurd û xewna xweseriyê, 1997
- Kurdistan, rêberê Edebiyatê, 1998
- Pirtûka Reş a Sedam Husên, 2005
- Çîroka dîroka Kurdistanê, 2007

Ev nivîskarê binav û deng di sala 1938'an de ji dayîk bûye û yek ji lêkolînerên herî navdar ê Rojhilata Navîn û bi taybetî pirsa kurd e.

Kirîs Koçêra li dor tevgera netewî – demokratîk a gelê kurd xincî nivîsîna çendîn pirtûkan, bi dehan semînar û reportaj û raport jî berhev kirine.

14.05.1396 (05.08.2018): Du pêşmergeyên PDKÎ tevlî karwanê sorxelat ên hizb û gel bûn

Di encama şerê di navbera hêza pêşmergeyên Hizba Demokrat û Spaha terorîstî ya Pasdaran li devera Pîranşehrê de çendîn pasdar hatin kuştin û birîndarkirin û mixabin li wê pevçûnê de 2 pêşmergeyên canfîda yê gel jî tevlî karwanê sorxelat ê şehîdan bûn.

Li gor nûçeya gihîştî bi malpera Kurdistanmedia, şeva Şemî li ser Yekşemî, 5`ê Tebaxa 2017`an, demjimêr 11`ê şevê, tîmek ji hêza pêşmergeyên navbajêr ên ser bi Hêza Pêşmergeyên Hizba Demokrat li dema encamdana me`imûriyetek hizbî li devera Pîranşehrê de ketne boseya çekdarên Spaha Pasdaran a Terorîstî û kirêgirtiyên wê de, û li encamp de şer û pevçûn derket.

Di wê pevçûnê de, derbek giran ji dujminên azadiyê ket û li gor nûçeya gihîştî 4 terorîstên ser bi Spaha Pasdaran hatin kuştin û şeş kesên din jî birîndar bûne. Herweha mixabin di wê pevçûnê de du pêşmergeyên fîdakar û dilsoz ên Hizba Demokrat bi navên Ye`iqûb Muradî û Hêmin Mewlannijad şehîd bûn û doma rê û rêbaza xwe bi hevalên xwe li nav Hizba Demokrat de spartin.

04.07.1396 (26.09.2017):Deftera Siyasî ya PDKÎ derheq birêveçûna referandoma ji bo serxwebûna Kurdistanê daxuyaniyek belav kir

Deftera Siyasî ya PDKÎ derheq birêveçûna referandoma ji bo serxwebûna Kurdistanê daxuyaniyek belav kir, ku di beşeke vê daxuyaniyê de hatibû:

Roja Duşemî 3`ê Rezbera 1396`an ya Rojî hevberî 25.09.2017`an referandoma serxwebûna Kurdistanê li gora bernameyên darêtî, û serbarê hemû gefên welatên navçê, û xwendinên cur bi cur ên beşek ji welatên cîhanê bi awayekî serkevtî û di nava rewşeke bi tewahî demokratîk û azad de bi rê ve çû.

Bi vî rengî rojeke girîng a nîştimanî û neteweyî di dîroka bixwîn û pirr ji karesat ya Kurd û di heman demê de, tejî ji xebta û berxwedana Kurd û Kurdistanê hate tomarkirin, û li serxistina vê piroseya demokratîk de, berxwdan û vîna bihêz ya serkirdayetiya Kurd li Başûra Kurdistanê û yekdengiya hêzên siyas ên vê perçeyê ji Kurdistanê roleke hêja û bibandor di şanaziyan de lîst.

PDKÎ her di destpêkê de, ku ew pirsa kete ber bas, ji riya çend daxûyaniyên fermî û dehan gotûbêjên medyayî ve, tevî piştevaniya xwe ji encamdayîna referandomê bo serxwebûna Kurdistanê, ew pirs wekî derfeteke zêrîn û pêngaveke neteweyî û nîştimanî da zanîn, û daxwaz ji hemû endam û alîgirên xwe di Başûra Kurdistanê, di welatên derve û Kurdistana Rojhilat kir, ku çi ji dest wan tê, bo hêsankarî û serxistina vê biryara dîrokî û piştevaniya ji wê encam bidin, û di her cihî dengê xwe bixin rex dengê xûşk û birayên xwe li Başûra Kurdistanê, û palpiştiya serxistina vê pêngava çarenûssaz bikin.

PDKÎ bi boneya birêveçûna serkevtiyane ya referandomê pîrozbahiyê dibêje serkirdayetiya Kurd, xûşk û birayên xwe li Başûra Kurdistanê, û hêzên siyasî û tewhaiya neteweya Kurd di hemû parçeyên Kurdistanê û cîhanê, û hêviya vê yekê dixwaze ku ew pêngav destpêka bidawîhatina êş û azarên Kurdan li Başûra Kurdistanê be, û bibe sedema bidestvehatina hêvî û armancên neteweyî û nîştimanî, ku bê guman wê bandorê li ser çarenûsa gelê Kurd danê.

(19.11.2017) 28.08.1396 :Deftera Siyasî ya PDKÎ derheq erdhejê û bûyerên piştî wê daxuyaniyek weşand

Kurdistanmedia: Deftera Diyasî ya PDKÎ derheq bûyera xwezayî ya erdhejê û alîkariya berfireh ya xelkê Kurdistanê ji xelkê zirardîtî re, daxuyaniyek belav kir, û ew alîkarî wekî afirandina hemaseyê (destanrêsiyê) ji karesatê bi nav kir.

Di beşeke daxuyaniya PDKÎ de hatibû:

Mixabin roja 21`ê Xezelwera 1396`an, bûyera xwezayî ya erdhejê li Kurdistanê da, û li her du aliyên Rojhilat û Başûra Kurdistanê wêraniyek zêde lê ket, ku ew wêranî û qurbaniya ku lê ket, li bajarên ser bi parêzgeha Kirmaşanê ew qas zaf bû, ku karesateke mezin lê ket.

Li gora hinek ji amarên rejîmê (ku

www.arsivakurd.org

gellek jî cihê baweriyê nînin, û wêranî û qurbanî gellek ji vê hindê meztir û zêdetir in) nêzî 500 kuştî û zêdetir ji 10 hezar birîndar lê ketine, zêdetir ji 12 hezar yekîneyên akincîbûnê bi tewahî herifî ne, û bi hezaran mal û yekîneyên din zirar dîtine, bi awayekî ku kêrî rûniştinê nahên. Çendîn bajar û nêzî 1600 gund jî ber xisara erdhejê ketine, û hemû evane û hatina sirr û serma û baran û qurbaniyên piştre û ...hwd, nîşan didin, û dibêjne me ku hejmara qurbanî û wêraniya vê karesatê gellek zêdetir ji vê bûye, ku hatiye ragehandin, û kûrahiya vê karesata mirovî piştre wê zelal be.

Herwisa Deftera Siyasî ya PDKÎ spasiyeke taybetî li hemû tex û qat û girûpên nava civaka Kurdistanê û neteweya xwedîmoral û çavvekirî û li ser hest ya Kurd dike, ku karesat li pey karesat û bûyerên nexweş li pey hev, bi ser wan de hatin, lê ew bi ew qasê moral û vîn û îradeyê ve pêkve bûn, û bi yekrêzî û hevsozî û hevpêwendiya mirovî û neteweyî destanrêsî afirandin, û ne tenê cîhan sersamê îradeya xwe kirin, belkû waneyên pêkvebûnê gehandin guhê têkoşerên xwe jî. PDKÎ şanaziyê bi neteweyeke weha dike, û di hemberî îradeya neteweyî û hesta pak û bêgerd ya mafxwaziya wan de serê hurmetê ditewîne.

09.12.1396 (28.02.2018): Navenda Siyasî ya PDKÎ derheq bidawîhatina 16.mîn kongireya PDKÎ daxuyaniyek belav kir

Navenda Siyasî ya PDKÎ derheq birêveçûna û bidawîhatina serkevtiyane ya 16.mîn kongireya PDKÎ daxuyaniyek weşand, ku di beşeke vê daxuyaniyê de hatibû:
Ji riya vê daxuyniyê ve em hemû aliyekî agehdar dikin, ku 16.mîn kongireya PDKÎ êvariya roja Sêşemiyê 1`ê Reşemeha 1396`an (20.02.2018)`an li gora vê bernameyê ku wekî destûra kar hatibû diyarîkirin, dest pê kir, û piştî çar rojan karê berdewam derengiyeke şeva Înê li ser Şemiyê, rêkewt 4`ê Reşemehê dawî bi karên xwe anî.

Kongireya 16.mîn ya PDKÎ di rewşeke taybetî û navçeyî de bi rê ve çû, ku pêwîst bû hem di warê siyasî û hem jî di warê emniyetî de, girîngiyeke berçav pê bê dan. Bi taybet ku Komara Îslamî ya Îranê bo derbelêdana li kongirê, yan pêşgirtin ji birêveçûna wê, di nava hewldanan û pîlandarêtinan de bû. Bi xweşî ve PDKÎ bi berçavgirtina hemû erkan bi taybetî di warê dem û cihê kongirê û parastina ewlehiya cihê kongirê hûrbînane reftar kir, lewra jî kongire di vî warî de bi awayekî serkevtî bi rê ve çû.

Salona kongirê bi çendîn diruşman hatibû xemilandin, ku eyankerê bîrûboçûnên demokratîk, neteweyî, û dadperwerane yên PDKÎ bû, ku kongire wekî kongireya "Rasana Rojhilat" pênase kiribû.

Kursiyên hevalên şehîd, Çeko Rehîmî, Kawe Cewanmerd, û Hêmin Mewlannijad ku nûnerê kongirê bûn, lê mixabin bi sedema şehîdbûna wan, berî birêvçûna kongirê betal bûn, bi qevdên gulan hatibbûne xemilandin.

Beşeke din ya karê kongirê bas li ser terhê guherîna pêkhateya hizbê bû. Ew terh ji aliyê beşdarên Kongirê ve bi awayekî têr û tejî bas li ser hate kirin, û guherîna bîr û boçûnan li ser hate kirin, û piştî berçavgirtina raya piraniya beşdaran, wekî terhê guherîna pêkhateya hizbê, bi dengê piranî yê beşdarên kongirê, hate pejirandin.

Herwisa hilbijartin bo lêpirsrawê giştî ê hizbê bi rê ve bir, di encam de hevriyê birêz Mistefa Hicrî bi piraniya dengê beşdarên kongirê, wekî lêpirsrawê giştî ê PDKÎ hate hilbijartin.

Piştre vê lêjneyê karê hilbijartina endamên Navenda Siyasî bi rê ve bir, û di nava kandîdatoran de, ku hejmara wan berçav bû, ew rêjeya ku kongirê bo Navenda Siyasî pesend kiribû, li çar gerên hilbijartinê de, serkevtiyên hilbijartinê ragehand. Di vir de îşare bi vê hewce ye, ku rêjeya beşdariya jinan çi wekî endmên nûnerê kongirê, û çi jî wekî endamên Navend Siyasî, heya qasekê hilkişiyan bi xwe ve dîtibû.

Hewcehî gotinê ye ku di navbera qonaxên bernameya kongirê de, lîste û navê van hizb û aliyên siyasî ên biyanî, Îranî û Kurdistanî, ku peyam bo kongirê şandibûn, ji aliyê komîsyona peyamên Komîteya Amadekar ya Kongirê ve bi agehdariya beşdarên kongirê gihîşt, û lîsta wan peyaman jî hatin ragehandin ku bi navê kongirê ve bo aliyên hewce tê şandin.

Herwisa komîsyonên sikala (şikayet, gilîname, doz) û biryarên kongirê jî, erkên xwe bi rê ve birin, û encam bi kongrê ragehandin.

Bi vî awayî 16.mîn kongireya PDKÎ serkevtiyane dawî bi karên xwe anî, û herwekî pêştir jî îşare pê hate kirin, belgenameyên kongirê piştî amadebûn û çapkirinê, wê bikevin ber destê xwîneran.

07.12.1396`an (26.02.2018) : Navenda Siyasî ya PDKÎ daxuyaniyek weşand

Navenda Siyasî a PDKÎ hilbijartiya kongireya 16-an a PDKÎ pêşnîvroya roja Duşemiyê rêkewt 7`ê Reşemeha 1396`an (26.02.2018) yekem civîna xwe bi beşdariya lêpirsrawê giştî ê hizbê rêzdar Kak Mistefas Hicrî û endamê Navenda Siyasî a PDKÎ pêk anî.

Di vê civînê de erk û deshilatên Navenda Siyasî a PDKÎ ku ji aliyê Kongireya PDKÎ ve hatine pejirandin, bi berçavrohniyeke zêdetir ve behs li ser hate kirin, û bi awayekî hûr li ser axavtin hatin kirin. Di beşeke din de li ser şêweya karê Navenda Siyasî a PDKÎ guherîna bîr û rayan hate kirin.

Di beşa dawiyê de jî, li ser pêşniyara lêpirsrawê giştî û paş dengdana beşdarên civînê, hevrê rêzdaer Hesen Şerefî bi dengê giştî wekî berpirsê Navenda Siyasî a PDKÎ, û di heman demê de wekî cihgirê lêpirsrawê giştî yê PDKÎ hate hilbijartin.

10.12.1396 (01.03.2018): Endamên PDKÎ li Hewlêrê bûne armanca kiryareke terorîstî

Du endamn PDKÎ bi navên Selah Rehmanî û Sebah Rehmanî ku bav û kur, û xelkê bajarê Kamyaranê û rûniştiyê Hewlêrê bûn, di encama bombeya ku di tirombêla wan de hatibû danîn, bi giranî birîndar bûn, ku mixabin Sebah Rehmanî kurê Selah bi sedema kûriya birînên xwe cane xwe ji dest da.

Di rêûresmekê de şehîd "Sebah Rehmanî" ku bi destê terorîstênTehranê, di bajarê Hewlêrê de hatibû şehîdkirin, di goristana şehîdên PDKÎ de bi axê hate spartin.Roja Înê 11`ê Reşemeha 1396`an, bi beşdariya Lêpirsrawê giştî yê PDKÎ û endamên Navenda Siyasî a Hizbê, kadr, pêşmerge, malbat û mêhvananên beşdar, termê şehîd "Sebah Rehmanî", ku roja Pêncşemî bi destê terorîstên rejîma Tehranê di bajarê Hewlêrê de hatibû şehîdkirin, di goristana şehîdên PDKÎ de bi axê hate spartin. Di vê rêûresmê de, "Hesen Şerefî" cihgirê lêpirsrawê giştî yê PDKÎ û berpirsê navenda siyasî axivî.

Şerefî di axavtina xwe de bas ji vê kir ku, îro em li rêûresma bi axê spartina xebatkarê neteweya me şehîd "Sebah Rehmanî" yê temen 33 salî, û kurê "Selah Rehmanî" kom bûne, da ku termê pîroz yê wî bi axa pîroz a Kurdistanê bispêrin.

Şerefî di doma axavtinên xwe de ragehand ku, du rojan berî niha destê terorîstên rejîma kevneperest a rejîma Îslamî a Îranê, gihîşte mala rêzdar "Selah" û bi zeliqandina bombeyek bi tirombêla wî ve, ku di encama vê kiryara terorîstî ya rejîmê de, Selah digel kurê xwe bibûne armanc, di encamê de jî Sebah jiber kûrbûna birînan canê xwe ji dest da, û Selah jî birîndar bûye. Berpirsê Navenda Siyasî a PDKÎ, di beşeke din a axavtinên xwe de got ku, rejîma Îranê ji tevgera kurd di Rojhilatê Kurdistanê de ditirse, û ji ber tirsa têkoşan û xebata PDKÎ, dest ji bo hemû karekî ku teror yek ji wan e dibe lê, bila rejîma Îranê vê yekê bizane bi encama kiryarên bi vî rengî, gavên me sist nabin belku bihêztir dibin. Piştre rêzdar "Selah Rehmanî" bavê şehîd "Sebah" axivî.

Rêzdar "Selah" di axavtina xwe de got ku bila rejîma terorîst a Îslamî a Îranê vê yekê bizanbe, ku bi vê kiryara rejîmê, îradeya min sist nabe û ezê tola vê kiryara terorîstî bistînim.

Navbirî herwisa got ku, sê kurê min hene, ezê her sê kurên xwe goriyê PDKÎ bikim, û ev kiryara rejîmê pêngavên min ji xebatê sist nake, belku gavên min ji bo pêşveçûnê bihêztir dike.

Banga Navenda Hevkariya Hizbên Kurdistana Îranê bo newroza 2718`an a Kurdî

Li bereberê hatina newroza 2718`an a Kurdî, Navenda Hevkariya Hizbên Kurdistana Îranê, bangewazek li jêr navê "Newroz Hêma û nîşana vejiyan û pêkvebûnê" belav kirin, ku tê de hatiye: Sala ku borî newroza camane (axabanî)yan bû, piştî wê hemû coşa ku îşare pê ahte kirin, cihê xwe ye ku newroza bê, bi heman coşê û bi camaneyan (axabaniyan) û hewrî (ebrî), û lixwekirina kincên Kurdî û hilgirtina gulên sor bixemilînin, û digel vejiyana xwezayê. Vejiyana newroza axabaniyan ji bo nîştima bikin diyarî, lewra em daxwazkar in ku yekdeng û yek helwest ber bi pêşwaziya ji newrozê û sersala nû ve herin.
Bêguman hevxebatî û yekrêziya neteweya me, remza serkevtina me ye. Ji vê dîtingehê ve jî em daxwazê ji tewahiya xelkê nevest û welatparêz ên Kurdistana Îranê dikin, ku bi heman îrade û morala xebatê li ser xebata xwe ya neteweyî-demokratîk berdewam bin, û refên xwe bihêztir û qahîmtir bikin, û sersala nû pîroz bikin.

www.arsivakurd.org

Xebatên civakî û netewî yên jina kurd

Hemze Reşîdiyan

Xebat û tekoşîna jinên kurd li civaka kurdistanê de xwedî dîrokek dirêj e. wan di her du milên civakî û netewî de tekoşînek bêhempa meşandine û nirxên giran jî jêre dane.

Qedera jina kurd jî li milê siyasî û neteweî de girêdayî qedera siyasî ya kurdan bûye. Qederek ku li jêr nîrê zordarî û bindestiya hakimên dagîrkar de, rûbarek xwînê ji ber çûye û heya niha jî negihaye peraveke aram, ku azadî û serbestî ye.

Bêguman rewşa siyasî ya kurdan jî li ser kultor û biyavên din yên jiyana wan de bêbandor nebûye û nehiştiye ku pêşve biçe û geşe bike. Wê paremayînê bandoreke rasterast li ser pêgeha jinê weke nîva civakê kiriye û rola wê ya girîng di civakê de nehatiye berçavgirtin. Lewma jina Kurd neçar e hevdem li gel meşandina xebata netewî, xebata li dijî kultura mêrserdestiyê jî bike.

Wan di vê xebata dûr û dirêje xwe de ezmûn û ceribînên baş bi dest xistine, û di pêxema bidestxistina mafên mirovî ên xwe li malbatê de dest bi perwerdekirina xwe kirine û cehd kirine ji vê riyê ve bandorê ji mentalîteya civakê bikin û çend gavan pêşde biçin. Ji ber ku wan bi dana înfomasiyonên hewce bo jiyanê bi keç û xortan, tevî parastina zimanê kurdî û perwedekirina zarokan, rûpelek nû ji pêşdeçûna şoreşa xwe vedane, û bi riyek nerm û aştiyane ve bi qasekî baş arasteya civakê guherandine, û bi vî awayî jî pêşiya gellek tundûtûjî û bûyerên nexwastî girtine.

Helbet şoreşên modern ên Kurdistanê û beşdariya jinan li bizavên kurdî de jî, bandoreke balkêş li ser hinek azadiya jinê hebûye. Girîngtir ji wê jî bi beşdariya rasterast û nerasterast ya xwe di şoreşan de roleke mezin lîstine. Ew beşdariye bûye sedem ku jin zêdetir bêne pêş û di qada xebatê de berçavtir xuya bikin û mafên xwe yên bingehîn bîne ber bas û lêkolînê. Xala girîng ya vê beşdariya jinan di şoreşan de, bandordanîna li ser mêrên kurd yên li nav şoreşê de bûye, ku ji riya wan ve jî hêdî-hêdî bo nav civakê de şor bûye.

Li vê derheqê de kêm nebûn ew mêrên ku bi eşkere piştevanî ji xwast û daxwaziyên jinan dikirin û bi piştgiriya xwe hêz û moralek taybetî dan jinan û berdewamiya wan. Her eva jî bûye sedem ku hizra mêrserdestiyê hêdî-hêdî li nava civaka kurdî de kêmtir bibe.

Avakirina Yekîtiya Jinan li Komara Kurdistanê de bi piştevaniya mêrên şoreşvan û berdewamiya wê heya niha di qada xebata civakî û siyasî de despêkek nû û baş bû li xebata rêxistinî ya jinan di pêxema dadperwerî û wekheviya civakî de. Avabûna vê yekîtiyê, rola jinan li nava civaka kurdistanê de guherand û jin tevlî organên siyasî kirin û nîşan dan ku ew dikarin weke mêran li şoreşê de beşdar û li karên îdarî de wekhev kar bikin.

Lê niha em dibînin ku jinên kurd hêşta jî li xebat û çalakiyên xwe bo bidestanîna mafê wekheviyê ranevestane û xebata xwe li nav partî, saziyên siyasî û medenî de dimeşînin û bi xebat û çalakiyên xwe karîne hinek azadiyan li malbat û civakê de bi dest bînin. Pêşkevtin û statûya jinan li demekê de hate diyarkirin ku wan li nava partiyên modernên kurdistanê de beşdarî kirine. Li nav partiyên pêşkevtî de karîne li aliyê siyasî û civakî de xwe perwerde bikin û bo bidestxistina deshelata xwe li nav partiyên kurdî de têbikoşîn.

Li nav şoreş û berxwedanên dawiyên Kurdistanê de, rolekê taybetî li aliyên jinên kurd ve hatiye lîstin. Jinên kurd bûne sembola berxwedanê li dijî dujminên gelê kurd, û hemû cîhan şanazî bi rol û berxwedana wan dike. Gellek jinên qehreman li wê berxwedanê û parastina rûmeta gelê kurd de canê xwe kirine goriyê gel û nîştiman. Berxwedan û rola jinên Kurd li dijî DAÎŞ`ê û bîra kore ya wan tu car nahê jibîrkirin, û ji bo heta-heta navê wan li nav civaka kurdewarî de wê bimîne, û ew li nav dilê her kurdekê de wê bijîn.

> Lê niha em dibînin ku jinên kurd hêşta jî li xebat û çalakiyên xwe bo bidestanîna mafê wekheviyê ranevestane û xebata xwe li nav partî, saziyên siyasî û medenî de dimeşînin û bi xebat û çalakiyên xwe karîne hinek azadiyan li malbat û civakê de bi dest bînin.

Lê dîsan jî jinên kurd nekarîne li gellek malbatan de li hinek herêmên kurdistanê mafê xwe yên bingehîn bi dest bînin, û zortir tesîra bab û birayan li ser jinê û xasma keçên malbatê de heye. Biryara dawî zortir di destê mêrên malbatê de ye, û pêşeroja jinê li aliyê zewacê de ew diyar dikin. Gellek jinên kurd dewre yan qutabxane, û zanko tewaw kirine, û zanyariya wan bo karên îdarî li serê ye, lê dîsan jî mafê kar li derweyî malbatê de bi wan nehatiye dayîn û bêkar li kuncê malê de rûniştine û karê xêzandariyê dikin.

Dema ku em bînin têkoşîna jinên welatên cîhanê û Kurdistanê berhev danên, newekhev in. Xebat û têkoşîna jinan li welatên rojava yê de bi şêwazekê din tê meşandin û wan ew dewrana xebata ku jinên kurd tê de ne, derbaz kirine. Ew bo karê wekhevî, mûçeyê wekhev, biryardan li ser qedera xwe, û li dijî tundûtûjî ya cinsî dixebitin, û xebat têkoşîna wan li wê çarçovê de didome. Lê jinên kurd li hinek herêmên Kurdistanê de hêşta li bin kevneşopiya civakî de dijîn û ji gellek mafên civakî bêpar in, û bêpişk in û hêşta xebatekê dûrûdirêj li pêşiya wan de ye.Jin jiyan e, û bê jin jiyan nameşe, û bi hêviya mafê wekhevî li civaka kurdistanê û guherîna bîr û hizrên mêran û civaka Kurdan li hemberî mafên jinan.
8`ê Adarê li hemû jinên Kurd û bi taybet jinên şoreşgêr pîroz be.

www.arsivakurd.org

Maşîna terorîzmê a Dewleta Îranê

Hesen Tebîre

Ji bilî cewherê terorîzm a Komara Îslamî a Îranê, ew di hemû heyama deshilatdariya xwe de, di asta navxweyî û herêmî de, ji kiryarên xwe ên terorîstî, wek yek ji stûn û bingehên hebûna xwe mifayê werdigire, û bûye egera fitne û têkdana ewlehî û tenahiya navçeyê, û derbiderbûna bi milyonan mirovî.

komara Îsalamî a Îranê bi hemû riyên berdest ji salên heftiyan pêde bi danîn û bicihkirina bombeyan li ser rê û otomobîlên pêşmerge û endamên hizbên Rojhilatî, qesda jehrawîkirina wan,revandin, şandina pirtûk û pakêtên bombekirî ji riya casûs û kirêgirtiyên xwe ve, û bi derev û xapandin û xiyanetên wekî rejîma Pehlewî ji bo şehîdkirina rêber û serkrdeyên Kurd Simko, karîn ku Dr.Qasimlo û Dr. Şerefkendî û hevalên wan jî şehîd bikin.

Hêjayî gotinê ye ku di salên heftiyan de li Başûrê Kurdîstanê navên zêdetir ji 200 qurbaiyên êrîşên terorîsî ên Îranê, ku 151 ji wan endam û kadrên Hizba Demokrat a Kurdîstana Îranê bûn hatiye tomarkirin. Bezandina axa Îraqê û Herêma Kurdistanê û binpêkirina yasayên navdewlet, û di sala 1375 (1996)an de, topbarankirina kempa Azadî a Hizba Demokrata Kurdîstana Îranê li Koyê ji aliyê Spaha terorîst a Pasdaran, û teqîna şeva Yelda ya 1395`an li pêşberî binkeya Defter Siyasî ya PDKÎ bû sedemê şehîdbûna 7 kesan ku 2 ji wan endamên Asayîşê bûn, û ya herî dawiyê êvara Pêncşemiya çûyî di derdora si`et 16:00 li nahiya Bineslawa du endamên PDKÎ bi navên Selah Rehmanî û kurê wî Sebah Rehmanî 33 salî li ber deriyê mala xwe bûne qurbaniyên kiryarên terorîstî ên Îranê, û bi mixabinî ve Sebah bi egerê birîna dijwar ku du lingên xwe ji dest dabûn, di sibehiya roja Înê tevlî karwanê şehîdên Kurdîstan û Rasanê bû.
Herwiha li Balîsan a navçeya Xweşnawetî , Qadir Qadirî kadrê PDKÎ hate terorkirin û tevlî karwana şehîdan bû.

Pirsyar ew e ku gelo çima dîsan komara Îslamî rêya terorê girtiye pêş? Wan cure kiryarên namirovane çi bandorek li ser xebata neteweya Kurd û Hizba Demokrat a Kurdistana Îranê bo gihîştin bi armancên şehîdan hebû?

Gelo Rejîm bi kuştina xebatkar û ciwanên Kurd gehiştiye encamekê? Piştî 20 salan bêdengiyê, PDKÎ biryara qonaxek nû di xebata xwe de ku dirêjîpêdana armancên pîroz ên Pêşewayê nemir Qazî Mihemed û Qasimlo û Şerefkendî ye, bi navê RASANê (Rabûnê) da. Hêviyek di nav dilê gelê kurd da çê bû, û ji aliyê endam û pêşmergeyên hizbê û xelkê Rojhilat ve pêşwaziyek mezin lê hate kirin da ku çiya û bajar hev bigrin û xebatek hevbeş pêk bînin, pêşmerge bi şêweyek medenî û bê şer bikeve nav bajar û bi gelê xwe re hevxebat be, lewma tirs û lerzîn ketiye dilê dijmin û bi piropagenda li dijî Rasan û biçûknîşandana vê tevgerê, û rûkirina li terorê, serkutkirina “pêşmergeyên şar”, milîtarîzekirina Kurdistanê, wisa nîşan bide ku me karî tevgera Rasanê ji nav bibin û hêj ev hêz û qavet maye ku her derî gef û tirs li ser me hebe, emê bikin armanc.

Eger bi bawer û hizra Komara Îslamî rêgirî ji xwast û daxwazên neteweyî ên Kurd bi serkut û teror, û zîndanê çareser be, eva li şaşiyek mezin da ye, heke terorê bikarîba tevgerê bêhêz bike, dibû piştî terora Dr. Qasimlo rêberê Hizba Demokrat, piştî terora D.r Şerefkendî û sedan heval û şoreşvanên Kurd, tu nav û nîşanek li hizba Demokrat û tevgera vî nemaba, îro ciwanên tevlî rêza Demokrat dibin, ne tenê poşman û du dil nînin, û paşve pêngav nehavîştine, belkî bi moraleke bilind pirtir li her demî Amadeyê şer, û xwegorîkirinê ne.

Hizbek ku piştevan û hêza wê ji gel û çiyayê wê be, xema jidestdana heval û hogir, û şehîdên xwe kiriye îrade û armanc, û bi moralek bilind bi domandina vî karwanî, bêguman wê biserkeve û bi ser dijmin de zal bibe.
Baweriya gel bi Hizba Demokrat

Hizbek ku piştevan û hêza wê ji gel û çiyayê wê be, xema jidestdana heval û hogir, û şehîdên xwe kiriye îrade û armanc, û bi moralek bilind bi domandina vî karwanî, bêguman wê biserkeve û bi ser dijmin de zal bibe

û tevgera Rasanê di astekî da ye ku babê şehîd Sebah bi şanazî ve li ser termê kurê xwe bi dengek bilind û bihêz rû li dewleta Îranê dibêje ku 3 kurê din jî min hene, û ezê wan jî bikim qurbana netewa Kurd û Hizba Demokrat, ez bixwe jî amade me serê xwe di vê rêbazê da bikim qurbanî . Riha wan şad û riya wan pir rêvîng. Di dawiyê de bi peyamên rêberê mezin û hertim zindî Dr. Qasimlo bo bîranîna şehîdan: “Gelek ku azadiyê bixwaze divê nirxa wê jî bide”, “karwana şehîdên me dirêj e, lê renge ji wê jî dirêjtir be”, “tu neteweyek bêy fîda û gorîkirina baştirîn keç û xortên xwe di çepera xebat û berxwedanê de negihîştiye armancên xwe”, emê serê xwe ber bejna hemû şehîdên kurdistanê bitewînin, û rê û şopa wan dê berdewam çiraya riya xebata me be.

www.arsivakurd.org

Zimanê Kurdî

Qursên Kurdî, A. Karabax

a. Xama xezal serejêr rewiya. b. Nêçîrvên, ji wî alî ve da dû wê...

c. Paşê xezal bûn didu, serejor kirin. ç. Nêçîrvan bi wir de vegeriya.

4. Hokerên pirsiyarî(pirsiyariyê) :

a. Ev hoker ji aliyê pirsiyariyê ve çalakiyan didin nasîn.

b. Peyvên van, ji peyvên pirsînê yên ku bi erkên hokerî bikar tên pêk tên.

Ji hokerên pirsiyarî : Çawa, çilo, bi çi, kengî, çi demê, çi wext, ka, li ku, li kuderê, ji ku, ji kuderê, bi ku ve, ji ku ve, çiqas, qasî çi, wek çi, hwd.

Mînak 518 : Hokerên pirsiyarî : Çend bikaranîn :

a. Çavên Gulçînê çawa ne? b. Nalîn çi demê dixebite?

c. Xama xezal li ku diçeriya? ç. Nêçîrvan bi ku de vegeriya?

5. Hokerên mêjerê(çendaniyê) :

a. Ev hoker ji aliyê mêjerê ve çalakiyan didin nasîn.

b. Bo kifşkirina van, pirsên bi (çiqas, qasî çi, wek çi, hwd) li lêkerên pêveberî tên kirin.

Ji hokerên mêjerê : Kêm, kêmtir, zêde, zêdetir, bêtir, kêm û zêde, pir, herî, hin, hinek, bes, sirf, bi qasî, bi çendî, ewqas, gelek, demeke dirêj, keliyekê, yek bi yek, deh bi deh, zehf, zor, hwd.

Mînak 519 : Hokerên mêjerê : Çend bikaranîn :

a. Nalîn kêm dixebite. b. Rojda ne tiral e, kêm û zêde dixebite.

c. Kalê wê jî ewqas dixebite. ç. Wî kalî, dar pênc bi pênc jimartin.

Ji helbestan : .../ Rehên zerhimîn yek bi yek bi xwe de hatin/.../A. Karabax

B) Di hinek erkan de bikaranîna hokeran :

Tiştonek

A: Mahir Berwarî

- Kawe le kargey koka kolay kerkuk kirêkar e.

- Kele kotkî aşê Susê, be şewî sêşem desûtê.

- Kujiyê tîrka dayê sor û zer e.
- Kûna mamê min qîrr pêve, qîr bi kûna mamê min ve.

- Gakey kakem, kakey gakey xuward.

- Geyiştime nêriyekî pir-çîn pirçin, her pirçim girt û helîhatimê, her pirçim berda û helîhatimê.

- Geyiştme tajiyekî rîxin rîxin, her rîx im bird le bo demî, her demî hêna lo rîxê.

- Çûçik û kûçuk di gomê de, min çûçik xwar ma kûçik.

- Sêv tilor bû sil tilûr min sêv xwar ma sil.
- Şiva sofî sîso şiş in.
- Yek hebî, yek nebî, vir ji virkira meztir.

Têdîtin: Amadekar destkariya devoka metelokan nekiriye

Xwendevanên hêja! Hûn dikarin bersiva tiştonekan bi riya E-Maila Agiri2003@gmal.com ji me re bişînin

www.arsivakurd.org

Agirî

◆ Rojnameya “Agirî” di van malperên jêrên de bixwînin:
◆ www.Kurdistanmedia.com
◆ www.Agirimedia.org
◆ rojnamaagiri@gmail.com
◆ www.facebook.com/Agirikirmanji

Navnîşana derveyî welat: AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE E - Mail: Agiri2003@gmail.com Hejmar (322)

Wêneyên merasima sersala nû di binkeya serekî ya PDKÎ de